Sexbêriya nexweşî û dinanî

Roja hilbijartinê ya li 17’yê îlonê, wê biryar li ser pêşeroja Swêdê bihêt dayin û ez û tu em bi xwe hildibijêrin. Em hemû xwedî berpirsiyarek in, graniya dengê me her yek e. Ma em ê xurtbûna civata xwe baştir yan xirabtir bikin bi vê kêmkirina kronekê ji her pênc kronên ji kîsê me yê beşdar ê bacê? Ma ew ê modêla swêdî bihêt pêşvexistin yan li cihê xwe hiştin?

Li Swêdê mafê her kesekî ji bo sexbêriya nexweşiyê heye. Bi baweriya me, gerek e li ser pêwîstiya mirovan sexbêrî û lênêrîn were rêkxistinê û ne li ser tiştek din. Serê sala çûyî qanûnek nuh bi rê ve ket. Ev qanûn rê na de ku yên xwedî pere ji xwe re bi kirrîna sîgorteyên taybetmend, dora xelkê dinê ji wan bigrin û her wisan ev qanûn ewle dike heger qezenca aboriya nexweşxaneyê hebe, ev qezenc ne keve kîsê kesên sîvîl. Bêyî xwedîbûna pere, bêyî rewşa temenê, bêyî cinsiyet yan ji kok û binyad ve bûyina endamê milletek din, mafê her kesekî ji sexbêriya nexweşiyê re, ji sexbêriya baş re, heye.

Sexbêriya nexweşiyê li Swêdê sexbêriya pêşemîntir a dunyayê ye
Sexbêriya nexweşiya li Swêdê li dunyayê yekemîn e. Bi alîkariya dermanên nuh û pir kêrhatî, ji bo yên temendirêj jî gelek ji nexweşî dihêne çareserkirinê yan jî aşkirinê.

Li nav Yekîtiya Ewrûpayê, li welatê Swêdê û li Fînlandê kêmtirîn mirina zarokên dergûşê diqewimin. Rizgarbûna ji nexweşiyên penceşêrê her ku dihere baştir dibe. Sexbêriya nexweşiyê ya li Swêdê, li gor sexbêriyên li welatên dinê, ya herî bi kvalîtetir e. Her wisan jî, ji gelek welatên din ên ewrûpî herzantir e.

Lêbelê sexbêriya nexweşiyê ya li welatê me, dikare xwe hîna jî baştir bike. Avahiya Bilind ya Kar û Barê Laşsaxiyê (Landsting) dirav wergirtiye, ku derfet û xêrhatina nexweşan bikaribe bihêt çaktirkirinê. Ji sala 1994’ê vir ve, jimareya doktoran 4 400 kes bêhtir bûye û jimareya hemşîre û pîrikan jî bi 12 300 pirtir bûye. Em berdewam in li ser vê riya çak.

Garantiya sexbêriyê (vårdgaranti) ya rêk û pêk
Piştî 1’ê Çiriya Duwem 2005'ê garantiya sexbêriyê ji bo her kesekî û ji bo her nexweşiyê heye. Pêwîstî nîn e, ku kes ji sê mehan bêhtir li hatina dora

sexbêriyekê bimêne. Li tevayiya welêt, ew kesên ku li dora sexbêriyê ne, her ku dihere pir kêm dibe. Heger li nav sînorên berpirsiyariya Avahiya Bilind Ya Sexbêriya Nexweşiyê di nav sê mehan de dor ne yêt ji bo kesê nexweş, wê gavê ew kes dikare li nav sînorên avahiyek dinê sexbêriyê bibîne. Bi giştî, piştî dawiya sala 2006'ê, wê Daîre sexbêriyê bi derfetên xwe garantiyê bikin.

Ji bo her kesî sexbêriya dinanî ya herzan
Divê mirov çi car nirxê dinanê çak kêm ne bîne. Piştî salên 1970'yî, sexbêriya dinanî ji bo her kesekî, ji bo zaro û xortan, ta 19 salî, belaş e. Ev sexbêriya belaş a dinanî ya ji bo zaro û xortan, ji me re bûye alîkar, ku me î roj sexbêriya dinanî ya herî baş heye. Li meha tîrmehê sala 2002'î, piştgiriya ji bo lêçûna bilind a sexbêriya dinanî (högkostnadsskydd) ji bo kesê temenê wan ji ser 65 salan, hat pêkhanînê. Ev derfetê dide mirovan ji bo çandina dinanê porselên û protetîkê. Ta nuha ji 130 000 kesan re piştgirî ji bo ev cûre sexbêrî hatiye kirin. Em li ser vê riyê berdewam in û her wisan em reformkirina sexbêriya dinanî (tandvårdsreform) ji bo tevayiya şêniyê xwe amade dikin. Li vî welatî gerek kes ne bêje; min sexbêriya dinanî na vê, ji ber ku gran e. Em dixwazin pereyê kontrolkirina dinanî daêxin û alîkariyê bidin wan kesan, ku lêçûna sexbêriya dinanê wan gran be. Gerek kes ji 200 kronî bêhtir pere ne de ji bo kontrola dinanî.

Alternatîva vê
Li hevberî vê ramyariya me ya ji bo sexbêriya baş û ewle, Moderat û hevbendiya wan a baskê rastê (högerallians) dirawestin.

Moderat dibêjin em ji bo tevayiya Swêdê sexbêriyek wisan ji her kesekî re dixwazin, ku perê vê sexbêriyê ji bêrîka me tevan derkeve. Lêbelê di pratîkê de, wek di Avahiya Bilind Ya Sexbêriya Nexweşiyê de tam tiştekî din dikin. Li wir Moderat dixwazin tevayiya sexbêriya polîklînîkî (primärvård) û temamiya nexweşxaneyan bikin bin destê kesên sîvîl (privat). Ew dixwazin di sexbêriyê de riyên qeymaxê (gräddfil) ji xwe re peyda bikin, da ku Nexweşxaneyên S:t Goran li Stockholmê rê bide wan kesên, ku bi pere xwedî sîgorteya sexbêriyê ne, bikevin pêşiya nexweşên dinê.

Em Sosyaldemokrat me çi car ev cûre sexbêrî na vê. Gava nexweşek were nav nexweşxaneyek dewletî, tiştê herî grîng ew e, ku ew nexweş, wê li gor rewşa nexweşiya xwe kengê û çawa bihêt sexbêrîkirinê, ne li gora hebûna sîgorteya kesî ya sexbêriyê. Li nexweşxaneya ku bi pereyê dewletê digere, wê çi car û çi riyên qeymaxê ne bin.

Moderat her wisan jî dixwazin hem pereyê sexbêriyê û hem jî buhayê dermanan grantir bikin. Ma bi çi awayî ewletî ji bo wan kesan dihêt baştirkirinê heger lêçûnên sexbêriyê û dermanan were buhatirkirinê? Ev pêşniyara wan herî pêşî li wan kesên bêpere û feqîr dixe.

Li Swêdê wê her kes beşdar be. Ma tu kîjan Swêdê hildibijêrî?